

DIE LINKE.

Kreisverband Oberhausen



Bernameya kurt a hîlbijartinê

Listeya DİE LİNKEYê ya Oberhausenê

Ji şêniyên heja yên Oberhausenê re,

Di 13ê îlonê 2020an de yê hîlbijartina encûmanên bajarê Oberhausenê, nunerên navçeyan û şaredar a mezin a Oberhausenê yên pêk were. Weke şêniyên Oberhausenê derfeteke wisa heye ku em karin li ser pêşketina bajar di salên pêşiyê me de biryara bigrin. Em listeya DIE LİNKEYê ku 210 000 mirovên li Oberhausenê dijîn digre nav xwe ne. Mirovên orjîna xwe û rewşa xwe yên civakî yên cuda, disa bi pêdiviyên wan ên jiyanî ji hev cûdatir û plansaziyên wan yên siberojê yên cihreng hene, li vir dijîn. Mijara ku me hemûyan tîne cem hev bajarê Oberhausenê ye. Em li vir dijîn, dixebitin, dema xwe ya vala li vir derbas dikin û têkiliyên xwe yên civakî li vir pêşdixin. Li gel cihîrengbûna me û şert û mercên me yên cuda yên civakî ku em tê de ne, divê herkes jiyanê baş û xweser bijî.

Listeya DIE LİNKEYê weke hêzeke mixalîf a li hemberî siyaseta neoliberal ku bajar diforişe, dewleta civakî/sosyal hêdî hêdî ji hole radike û cihên xwezayî tune dike, derdikeve pêş. Listeya DIE LİNKEYê yekîtiyeke ji çepgirên Oberhausenê, herwiha ji endamên Partiya DIE LİNKEYê û kesên çepgir ên serbixwe pêk tê. Em naxwazin siyaseta wekaletê ji bo niştecihên Oberhausenê pêşbixin, em dixwazin bi wan re û bi hev re siyaseta pêşbixin. Ji ber vê yekê jî em hewl didin bi hemû kom û însiyatîfan re ku ji bo cihaneke alîkariya hev dike û ji bo jiyanê civakî dide têdikoşîn, bî gel hevdu.

Di pêvojaya parlemantoyê ya siberojê de, ji bo LİNKEYê/Çepgirên bi hêz divê gelek tişt bî kirin. Bernameya me ya kurt a hîlbijartinê ne tenê weke bernameya hîlbijartine ye, di heman demê de jî bernameya xebata ya fraksiyona Listeya DIE LINKE piştî hîlbijartinê yê di meclisa şaraderiyê ya bajar de ye. Ew li ser bingeha beşdarbûna civakî ya şêniyên bajarê Oberhausenê û bilindkirina qalîteya jiyanê ya ji bo hemû kesên ku li Oberhausenê dijîn, hatiye amadekirin. Ew bername herçiqasî zehmet bê jî lê ji bo mirovên li Oberhausenê dijîn û jiyanê civakî, ekolojîk û demokratîk dixwazin, pêkan e.

Em bi vê îdîayê we hemûyan vedixwînin ku li bernameya kurt a hîlbijartinê bi awakî rexnegir binêrin û em hewl bidin bi hev re siberoja Oberhausenê ava bikin.

Bêguman hûn dikarin bernameya me ya berfireh ku 400 daxwaz û armancên siyasî yên ji bo qadên heremî hatine amadekirin, bixwinin. Hûn dikarin ev bernameya berfireh ji navanda Linken Zentrumê, ji standên me yên agahdariyê, an jî li ser internetê bi dest bixin.

1. Ji bo bajarekî demokratîk û mayînde

Divê bajar ayda kesên ku li wir dijîn û dixebitin bê. Divê şênîyên bajêr karibin li ser bûyerên siyasî yê li herem an jî taxa wan diqewimin, biryarê bidin. Em dixwazin mafên başdarbûnê yê demokratîk bînin berfirehkirin û herwiha em dixwazin sazîyên îdarî di her asta de vekirîbin. Pêwîste ku qadên xizmetê ji bo raya giştî bînin berfirehkirin û divê gel wan derfetan bê astengan karibin birkarbin. Werzîş, çand û ciwan divê bi awayekî hêsan bigêhejin hevdu. Ji ber vê jî divê ew qadan mayînde bin. Bihêzîkirina navendên ciwanan û çanda xweser perçeyê giring a siyaseta me ye. Loma jî em dixwazin bînesaziya werzîşê mezin bikin û biparêzin (salon û qadên werzîşê, herwiha hewzên avjeniyê yê derva û hundir).



2. Ji bo wekheviya civakî

Têkoşîna ji bo wekhevîya civakî ji bo me rêgezên misoger in. Li gel pêşketinên aborî yê salên dawî li Elmanyayê Oberhausen navendeke xizaniyê ye. Gelek kes li Oberhausenê di bin şert û mercên xizaniyê de dijîn. Di qada civaka bajarî de her ku diçe newekhevbûna civakî kûrtir dibe. Ji ber vê jî pêwîstî bi polîtîkayeke sosyal/civakî ya mayînde heye. Em ji bo pergaleke civakî ya ji bo civakeke bê tirs û bê kriminalîzekirin radibin, da ku ji bo hemû kesî derfetên başdarbûna jiyana civakî pêkan be.

Em dixwazin ji bo entegrebûneke baş di kar û têkiliyên kar de derfetan amade bikin, da ku ev pêvajoyê hêsantir bibe. Ji ber vê jî divê rayedarên bajêr derfetên perwerdeyê berfireh bikin û di sektora qada giştî /sektora îdareyê de divê karên nû bînin afirandin.

3. Di nava liv û tevgerê de bûyin ji bo me hemûyan feyda xwe heye

Di nava liv û tevgerê de bûyin tê wateya başdarbûna jiyana civakî. Di nava liv û tevgerê de bûyin ji bo me tê maneya bi hewldanên kêr weke di demekî kin de, dîsa bi enerjî û pereyê kêr gihîştina qadên jiyana/ qadên jiyana civakî. Em dixwazin tora jîngehê ya trafîka bi lingan, bîsîkletan û veguhastina giştî ya heremî bi hêz bikin û bajar wisa pêşbixin, da ku kes pêwistiyê bi erebeya xwe nebin. Ji ber vê yekê ji bo me di navende de pêşniyaza tevgerbûnê ya raya giştî heye. Tevgerbûn tedbirekî jiyana ye! Ew tê wateya têkoşina ji bo veguhastina giştî ya heremî, zêdekirina riyên bîsîkletan û çêkirina riyên peyayan e.

4. Mafa ji bo xaniyên erzan

Piraniyên şênîyên Oberhausenê di xaniyên kêr de rûdinin. Bazara malan niha li gel me pir dijwar e û bi taybetî ji bo kesên ku kêr qezenc dikin zehmetê ku malekî karibin bibin. Em dixwazin bi awayekî lez û bez xaniyên ji bo kêreyên mayînde ku karibin bên dayin, ava bikin. Ji ber vê yekê jî em banga avakirina koperatîfên xaniyên bajarî dikin. Di heman demê de avakirina riyên nû yên zêde pêşî li xaniyên ku bi dabarekî kêr jî karibin bên finazekirin digirin. Ji ber vê sedemê bi taybetî jî kesên teqawî û malbat ditîrsin da ku milkên wan ji dest wan biçe. Lewma jî em banga betalkirina mesrefên ji bo riyên nû dikin.

5. Derfetên baş ji bo hemû zarok û ciwanan

Zarok û ciwanên me derfetên herî baş qezenc dikin. Ji ber vê jî em ji bo lîstîna bêpere û baş, dîsa perwerdeya ji bexçeya zarokan heya dibistanan dixwazin. Em ji bo hemû zarok û ciwanan jî dervayî muçeya malbata xwe, dîsa dervayî orjîn, ol an jî astengiyeke ku heye karibin wekhev ji derfetên perwerdeyê sûd werbigirin û rastî neheqiyê neyên radibin. Lewma jî em ji bo hemû zarokan di baxçeyên zarokan de cihên lîstîna rojane dixwazin û dibêjin „dibistan ji bo herkesî“. Em pergaleke dibistanan ku baş hatiye amadekirin, têgihiştî û bêkêmasî ji bo hemû xwendevanan dixwazin da ku ji hemûyan re derfetên pêşketinê bên pêşwazîkirin.

6. Li dijî krîmînalîzekirinê, Bera Hev Dan/Sorkirin, Dijmîntiyê

Oberhausen wek mîzina herêmê ya pîşesaziya/endustrîya Ruhrê tê bi nav kirin û xwediyê dîroka koçberbûnê ye. Bi taybetî jî cîherengbûna Oberhausenê ji bo jiyaneke aşîtxwaz derfeteke baş a entegrasyonê ye.

